

Îran îdiayê dike ku ew
bombeyê naxwazin!

»»» R:7



Dîktator her maye!

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (409) 07-11-2021 Buha (1000) Tûmen

Zimanê medyaya koloniyalîzê
li derheq wate û destewajeyên
taybet bi Kurdistanê

»»» R:6

Doza Kurdî di navbera
otonomiya Rûsan û
şaredariya rêjîmê de

»»» R:8

Zivîstana sar û kêmtirxemiya hikûmetê

Her kesek di Îranê de jiya be dizane ku dewlet di dema tengahiyê de ti carî bi hawara xelkê ve nehatiye. Ev dema ku hewcehiya xelkê bi dewletê hebûye, dewletê çî alîkariyek nedaye xelkê û ev dema ku hewcehiya xelkê jî pê nebûye, dewlet hatiye ser şeqaman behsa alîkarîdan bi xelkê kiriye.

Ev raştiye jî salane û di demsala zivîstan û sir û baranê de zêdetir tê xuyakirin û xelk zêdetir ditirsin, axo tu bêjî sira îsal ji ya par diwartir nebe? Tu bêjî me îsal gaz û neft hebe da ku em li sirê de req nebin? Tu bêjî îsal lehî mala me vêran neke û erdhej canê me ji me neştîne? Tu bêjî îsal şewat hebe heta ku hatinûçû asayî bin û kelûpel û hewcehiyên jiyanê vê zedetir giran nebin? Ev û dehan pirsîyar û egerên din ku dibine kelek û rojane xelk tûşê wan dibe û bala xelkê bi aliyê xwe ve radikêşe! Nemaze îsal ku her wek ji havînê ve berpîrsên pêwendîdar huşdarî dane ku egera nebûna şewatê heye û divê rêçareyekê bo bibînin. Lê kê bîr ji vê rêçareyê bike? Bo mînak Wezîrê



Nefta rejîmê, “Cewad Ocî” di 14’ê Xermanan îsal de pêşbîniya kêmiya gazê di demsala sirê de kiribû û ragihandibû: “Bi Jiberçavgirtina meşa niha ya bikaranîna gaza surûştî di Îranê de tê pêşbînîkirin ku 200 milyon metra çargoşe me kêmiya gazê di demsala sirê de hebe”.

Yek din ji wan arîşeya kêmbûna berqê ye û îsal em ji demsala Buharê ve her şahidê nebûn û kêmbûna erqê di Îranê de bûne û divê dîsan em wek dehikên 40 û 50 ên Rojî şahid bin ku dîsan xelk di tarîtiyê de bijîn. Her di vê derheqê de “Musên Terzteleb” Birêveberê Gîştî yê Kompaniya Berhemanîna Berqa Vizegahên Heraretî ên rejîmê tevî nîşandana nigeraniya xwe li derheq nebûna şewat û gaz daye zanîn, “ku em ê di Zivîstana îsal de bi sedema kêmbûna şewata hewce tûşê arîşeyek micid bo dabînkirina berqê din!

Divê navberê de eva ku cihê dax e û divê xelkê Îran zêdetir li dijî helwêstan bigirin eva ye ku di halekê de xelk digel kêmiya şewat û berqê rû bi rû bûne, eva xelkê Lubnanê li siya rehima berpîrsên Komara Îslamî asûde bûne û bi saya samanên surûştî yên Îranê ji kelecana bêberqî û bîneftiyê dûr kevtine! Di halekê de berpîrsên Lubnanê ragihandin ku ew îsal raştî bêberqiyê hatine, bilez û bê yekûdu ji Tehranê ve biriyara giHANDINA tankerên neft û benzîn û şewatên din bo Hizbullah Lubnanê hate şandin û rejîmê bi şanazî ve jî wêne û vîdiyoyên giHANDINA wan şewatan bo Lubnanê di televîziyonên xwe de belav didikirin.

Eva ev raştiya tal e ku îsal xelk di Îranê de divê ezmûn bikin: **Zivîstana sar, kêmiya şewat û bêxemiya desthilatê.**

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Mirov di geriyana wê cîhanê de gelek caran seh bi tenêbûnê dike. Ev seha tenêbûnê hin caran ji ber çolatiya derdora xwe ye û hin caran jî bi sedema pirs-girêkên hundirî ye ku tûş dibe, wisa dizane ku di vê cîhanê de tenê maye û şik ji hemû tişt û kesê heye. Seha tenêbûn di çolatiyê de gelek caran pêşîra kesên kêmtemen digire, dema ku di kolaneke tarî û çol de derbas dibin an ber bi cihekê ve ku kes li wir nîne rê dikevin û nigeranî û tirs tev cestayê wan digire û bo vê yekê denge dengekê çê dikin da ku heştên tenêbûna wan here, ji xwe ve deşt dikin bi hawar û bi dengek bilind diaxivin. Ew haware, dengê netirsî û zîrekatiyê nîne da ku dujminên xwe bitirsînin, belkî hawara tirs û zirarçûnê ye da ku guhdarê hawara xwe bin û hin moralê bidine xwe.

Heyamek e Komara Îslamî û nemaze Spaha Padaran a wê rêk di wê rewşê de asê bûne, û hesteke gelek zêde ya tenêbûnê ew girtine! Ew tenêbûna Komara “Fîlayeta Feqîh” her du aliyê tenêbûnê li xwe digire, çimkî hem bi sedema kiriyarên xwe bi tevahî tenê maye û di wê tenêmana gelek dijwar a xwe de seh dike ku tev dinya bûye dujminê wê û hemû cihek bo wan pîlanan dadirêjin, lewma tê dîtin ku di kiriyareke nişkê ve hevaltiyê û pêwendiya çendîn dehika xwe digel aliyan didorîne û bi axavtin û lêdwanên bê cî, arîşeya siyasî û diplomatîk û heta leşkerî jî bo xwe diruşt dike.

Mînakên berçav ên di heyamên borî de, me pirs-girêkên

Hawara di çolatiyê de



wê ên digel Tîrkiye, Azerbaycan, Îraq û...hwd dîtiye ku wisa lê hatiye, Xamineyî û banda wî, ji tirsan ve xwe dikin bi armanc.

Ji aliyek dinê ve, ev seha tenêbûn û di xelwetmanê, tirsek kûr li cem wan afirandiye û her wekî ew zarokê ku tenê di çolatiyekê de diçe û bo vê ku moralê bide xwe û netirse hawarê dike!, Komara Îslamî jî diruşt kevtiye di wê haletê de û bi qîjeqîj û hawar-hawarê dixwaze dilê alîgirên xwe rabigire û dilê besicên wê neteqe!

Çend roj berî niha Spaha Padaran êrîş kire ser neftkêşek “Vîetnam”ê û operasyonêk bi awayê gelek henekî bi rê ve bir û bi awayê hawar ragihand ku wan gemiyek Îranê di deştê Artêşa Amerîkayê de rizgar kiriye û wekî Pasdara Selamî digot, Amerîka adet kiriye ku berdewam ji aliyê Îranê ve raştî şikestê bê! Lê aliyê raştiya wan hemû gef û gure-gurane tenê bi lidarxistina manorên leşkerî ye, çî li hember Azerbaycan û çî li hember Kurdistanê û çî li kendavê û tev hawarên din, tenê û tenê hawar û qîjeqîjên çolatiyê ne, da ku guhdarê hawara xwe bin û hin moralê wergirin. Xamineyî banda wî ya mafiyayî, wisa bitenê maye û seha tenêbûnê ew girtine, ku deşt bo henektirîn kiriyaran dibin da ku hin moralê bidine besic û pasdarên xwe û bi dengê hawarên xwe, zal bin bi ser tenêbûna xwe de, hekî ne ew her ji oda xwe ya bêhnwedanê jî guman heye û li wir jî asûde nînin û ditirse.



Dîktator her maye!



N: Nûredîn Sofîzade

Di hemî sîstem û hikûmet û deshilatên zordar û dîktator de, ku ti rewaiyek û rizaya xelkê digel nîne, belkî tenê bi derba zorê û sitem û çavtirsandinê ve cehd têtêkirin ku xelkê bêxe bin rikêba xwe û deshilata xwe ya zalimane bi ser wan de bisepînin.

Dîktator hindê zêdetir bikarin bi girtin û kuştin û tirsandinê deshilata xwe biparêzin, hin zêdetir çavê wan tarî dibin û hovanetî dikeve canê xelkê û kuştin û xwînrêjî bal wan dibe tiştê adetî û surûştî. Ku wisa ye wê deshilatê ti rewaiyeke xelkê çinîne û kite mikanîzma ku wisa dizanin dikare wê biparêze û hêza tepeserî û girtin û kuştin û tirsandina xelkê ye.

Rejîma niha ya Îranê jî ku ti rewaiyeke xelkê welat digel de nîne, bi girtin û kuştin û tepeseriya ku bi ser xelkê de dike, mirov dikare bêje rûyê hemî dîktatorên dîrokê sipî kiriye.

Her dengê mafxwaziyê bi girtin û cezayê giran tê bersivdan; Her azadiyeke siyasî, civakî, rêkxistinî, wekhevî, mafê netewî, mafê olî û çandî di Îranê de û ji aliyê wê rejîmê ve qedexeyê, û her kes û aliyek basê wan mafane bike digel girtin û kuştin û cezayê giran hember dibe û tê tepeserkirin.

Eva şewaza hikimdarî û deshilata wê rejîmê bûye, lê dema em lê dinêrin hindê pêde diçe û astê hişyariya xelkê diçe serê û baştir ji mafên zevtkirî yên xwe ji aliyê wê rejîmê ve tê digîjin û eva jî dibe sedem ku dengê xwe bi dijî wê rejîmê bilind bikin; bê guman rejîmê zêdetir hov dibe û ew jî astê tepeserî û dîktatoriya xwe



zêdetir dike û bona bédengkirina xelkê, ji her emrazekê mifahê werdigre.

Hewce ye ku xelkê Îranê ku wê deshilatê bi ya xwe nizanin û bal wan rewaiyê çinîne, û bona gehîştin bi maf û azadiyan ku ew jî bikarin wekî mirovên serdem bijîn, divê berhevdanekê bikin û bizanin ka sedemê sernekevîna wan bi ser wê rejîmê de çî ye? Dibe bizanin ku sedem çî ne ku wê rejîmê berdewam kariye bi sanahî dengê xelkê mat bike û wan tepeser biket? Dibe xelk ji xwe bipirsin, gelo di demekê de wê rejîmê ku çî rewaiyek di nav xelkê de çinîne û xelk wê bi ya xwe nizanin, çima xelk nikare wê rejîmê sernixûn biket û ji destê wê dîktatoriye xelas bibe? Bêguman rege piraniya xelkê Îranê bersiva wê pirsyarê peyda kiribin û bizanin.

Sedemên herî sereke ên heya niha mana wê rejîmê dikarin ew xalane bin, ku rege hin kesên dinê jî seh bi sedemên dinê jî kiribin.

1- Nebûna alternatîvek ku bikare piştî sernixûniya wê rejîmê bête ser kar; bê guman berî hemî xelkê Îranê jî, rejîmê her bixwe jî gelek bi başî seh bi vê yekê kiriye

û zaniye, lewma berdewam propaganda hindê dike û dide zanîn, ger ew rejîma nemîne, dê rewşa Îranê jî wekî ya Sûriyê lê bê; bê guma ev yeka jî bandorê didanê ser xelkê û kesên wisa hene ku bêjin hebûna dîktatoriya wê rejîmê baştir e ji vê yekê ku em wekî xelkê Sûriyê malvêran û der bi der bin û hêminiye bi xwe ve nebînin.

2- Nebûna yekîti û hevxbatîyê di navbera wan hêz û aliyên siyasî yên ku xwe dijberê wê rejîmê dizanin.

3- Nebûna rêberiyek bihêz û xwedî bandor ku xelk bikare hem peyam û hêla xebatê jê wergire, hem pê piştqahî û dilgerim be.

4- Nebûna yekgotariyek di nava opozisyonê de ku bikarin li ser sîstema hikûmeta piştî wê rejîmê gel hev pilatformekê dabînin.

5- Nebûna piştevaniya seranserî ji her serhildan û nerizayetiye ku rege li parek ji navçên Îranê de bête pêş, bo mînak bi hegera cudahiya netewî û olî, yan pişeyî û qatî û cinsiyetî, dema ku yek ji wan texane nerizayetiye didine xuya û xwenîşandanê dikin û daxwaza tevlibûna xelkê seranserê Îranê dikin,

mixabin xelkê yek ji navçan, yan neteweyek, yan olek yan sinfek xwe tenê dibîne û rejîm jî gelek bi sanahî û hovane tepeser dike.

6- Piraniya xelkê Îranê bi sedema siyaseta bi zanebûn a rejîmê, ku rastî dehan pirskirêkên civakî bûne û bi taybetî li warê aboriyê ve ku rejîmê xelkê rût û bîrsî û mihtac kiriye, jiyana xelkê wisa lê hatiye ku berî ewê ku xelk li hizira azadî û mafê xwe de bin, mixabin şev û roj xistine ser hev ku bikarin pariyeke nan bo mal û zarokên xwe peyda bikin.

Belê ev û rege gelek sedemên dinê jî bûne sedem ku ew rejîma dîktator û zalim heya niha bimîne û jiyana xelkê welat roj bi rojê ber bi rojreşiya zêdetir ve biçe.

Lê axavtina dawî jî eva ye ku bê guman kerb û kîna pendavxwarî ya xelkê dê rojekê ne gelek dûr de biherike û deshilata dîktator a axûndên kevneperset biherifîne; ger îrada serhildana li hember zulm û sitemê de hebe, çî dîktatorekê nekariye xwe ji sernixûniya li hember hêza xelkê de bigire.

Bê guman eva qedera rejîma Komara Îslamî ye.

Şanoya Dayîka Nîştiman



Berhevkar: Keyhan Mihemedînijad

Rêkevta 16-9-1942 bo gelê Kurd rêkevtek dîrokî ye. Wê demê Komeleya Jêkaf (JK) ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve hate avakirin.

Her li ser bingeha (JK) sala 1946`ê Komara Kurdistanê ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed û kesên rewşenbîr û siyas-etvanên Kurdistanê ve hate avakirin.

Di wê serdemê de gelek karên girîng ji bo hişyarkirina Kurdan hatine kirin. Yek ji wan xebatan şanoya “Dayîka Nîştiman” bû. Şanoya Dayîka Nîştiman bi yekem şano bi zimanê Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê tê hesibandin.

Şehîd Qazî Mihemed di derheq şanoyê de gotiye: “Eva tiştek teblîxî ye bo miletê Kurd, wek vê yekê ye ku ez herime ser sehnê ji bo xelkê biaxivim. Lê bandora nimayîşê li axavtinên kesek wek min zêdetir e, îcar lewma divê hûn bi ciwanî nimayîşê liber bikin û rahênanê li ser bikin.”

“Chris Kuschera” di pirtûka xwe ya bi navê “Tevgera Netewa Kurd” de nivîsiye: “Qazî Mihemed çend şanoyek bi naveroka dîrokî û nîştimanperwerane nivîsiye, nemaze behsa dirama dîroka Selahedîn, ku xebata Kurdan li dijî Xacperestan e dike an jî şanonameya Dayîka Nîştiman ku qedera gelê Kurd piştî peyman a “Se`idabad” a di navbera Îran, Îraq, Tirkiya û Efxaniştanê (1937) de ye vehûnandiye. Ev du şanonameyane li bajarê Mihabadê hatine pêşkêşkirin.”

Tê gotin ku şanosome li serdemê Komara Kurdistanê wate di sala 1956an de hatiye pêşkêşkirin.

Tê gotin ku pênc sehne hatine pêşkêşkirin, ku ev jî ev in: “Sehneya Firîşte, Peymana Seidabad, Dayîka Nîştiman, Rizgarkirina Dayîka Nîştiman û sehneya avabûna Komara Kurdistanê”.

Çiroka wê wiha bûye: Firîşteyek behsa mirov, wargeh û nîştiman dike, Dayîka Nîştiman hatiye zencîrîkirin û daxwaza azadî û rizgariyê dike, xortên dayîka Nîştiman ve tînin, dujmin pîlan û pîlanên serkutkirinê bi rê ve dibin, pêşmerge û rizgarker dayîka Nîştiman rizgar dîkin, Kurd digihe bi hêviya xwe û Komara Kurdistanê tê avakirin.

Heyam Şanoyê

Tê gotin 2 û nîv heta 3 demjimêr heyama şanoyê bûye, lê di navbera herdu sehneyan de, 10 heta 15 xulek girûpa mûzîkî, mûzîk lêdaye û kora sirûdê jî sirûd xwendîye, bi vî awayî 40 heta 60 xulek mûzîk û sirûd hatiye pêşkêşkirin. Bi vî awayî şano 90 xulek bûye.

Sirûdên “Xudaya Weten Ava Key”, “Mekteb Metle`î Se`adete”, “Erê Hey Kurdistan”, “Kurdistanî Ciwan” û “Dîniman Ayînman” di nav şanoyê de hatine xwendin. Nimayîşa şanoyê wiha bû: Firîşte, Dayîkî Nîştiman, Nûnerên Îran, Îraq, Tirkiya û Efxaniştan, Serkomar, Pêşmerge 7 heta 8 kes û endamên kabîneyê jî çend kes bûn.

Cihê pêşkêşkirina şanoyê li Mihabad, Nexede û Şinoyê bû.

Ev şanoye 40 roj heta du meh dom hebûye. Bo şanoya Dayîka Nîştiman gelek kes hatine gazîkirin û ji wan “Ce`iferof” digel çend efserên Reûsî beşdar bûne.

Deştpeka şanoyê “Sîrûs Hebîbî” ku li cihê Firîşteyê de lîstîye bi kincên sipî û du perên ku li nav milên wî bûn û tê ser şanoyê û wê helbeşa Hacî Qadir Koyî dixwîne: Ey bê nezîz û hawta, her tuyî ke berqerar î

Bê dar û bê diyar î, bêdar û payedar î

Bubaxî merdî baxî, sermayekey xezan î

Bo mezre`ey feqîran, sermayekey behar î

Tu padişanîşan î bo her sewadî e`izem

Bê sedr û şanîşînî, bê perde perdedar î

Xelaqî bê futûr î, sultanî bê qusûr î

Rezaqî mar û mûr î, avdêrî dêmekar î

Feyruze textî gerdûn, mensu`î neqşî tu ye

Yaqut û le`ilî roje, estêrekan derare î

Her cê û mekanî tu ye, bê cê û bê mekan î

Leyl û neharî tu ye bê leyl û bê nehar î

Her emrî tu medar î, bo karûbarî alem

Herçende bê wezîr û bê sedr û karûbar î

Sehneya duyem ya şanoyê sehneya hevpeymaniya Se`idabadê bûye.

Di navbera wê beşê de sirûd û mûzîk tene belavkirin. Sehneya sêyem Dayîka Nîştiman bi kincên reş û pirça sipî, deşt û pêyên wê hatine zencîrîkirin û bi dengê xweş helbeşa Hacî Qadir Koyî dixwîne.

Di navbera wê beşê de jî sirûd û mûzîk tene belavkirin. Di sehneya çarem de Hêza Pêşmerge Kurdistanê û leşkerên Rûs, Dayîka Nîştiman rizgar dîkin.

Sehneya pêncem jî pêkanîna Komara Kurdistanê û Şewreya Wezîran û bilindkirina alaya Kurdistanê û diyarîkirina Serkomar e.

Di vê sehneyê de Serkomar dipeyve û basa azadkirina Kurdistanê dike, û behsa bindestbûna netewa Kurd di bin deştê Tirk, Ecem û Ereban de dike. Behsa Kurdistanê mezin û rêbaza Şêx Ebdulqadir, Şêx Seîd, Şêx Mehmûd û xwebextkirina wan bo Kurdistanê dike.

Di dawiyê de tev beşdarbû tene ser sehneya şanoyê û sirûda “Nîştiman Rengîne” dixwînin.

Tê gotin ku piştî şanoyê “Pêşewa Qazî Mihemed” tê ser sehneya şanoyê û bi çavê giryan ve diaxive û xelk jî hevdem digel Qazî Mihemed digrîn, tê gotin heta rûndikê Rûsan jî tînin. Qazî Mihemed li wir beha dîroka xebata Kurd kiriye û behsa koloniyalîstî û parvekirina Kurdistanê û serkutkirina netewa Kurd ji aliyê dewletan ve û herwisa behsa şoreşên Kurdistanê kiriye.

Çavkanî: Pirtûka “Şanoyê Dayîkî Nîştiman û Şanoyê Koşkî Awat” a bi zaraveyê Soranî û torên civakî

Şêweaza helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih û balkêşandin li ser zimanê helbestên wî



N: Niyaz Berzencî

Şêx Nûrî Şêx Salih yek ji wan helbestvanan e ku helbestên Kurdî nû kirine. Mamošta “Goran” bixwe di belavoka “Beyan” a hejmar duyê de belav kiriye û gotiye: “Şêx Nûrî pêşengê helbestên nû ên Kurdî ye”.

Bi vî awayî nûkirin û nûjenkirina helbestên Kurdî ji aliyê Şêx Nûrî û mamošta Goran ve hatine kirin. Herçiqas ku ew du helbestvanane Îstambol nedîtine û wekî helbestvan û nivîserên wê sedema Kurdîstane neçûne Îstambolê, lê helbestên nû û modernên Tirkî gelek karlêkerî li ser wan hebûye. Ew guherinkariyên ku di helbestên Tirkî de hebûne, bi sedema “Namiq Kemal û Tofik Fikret” û... bûne ku karlêkerî li ser kirine. Eva di halekê de ye ku mamošta “Pîremêrd” nêzî 25 salan di Îstambolê de jiya bû. Raşt e ku mifaheke zêde ji wî vergirtibûn lê karlêkeriya helbestên nû ên Tirkî ji aliyê “Pîremêrd” ve nebû.

Mamošta “Goran dibêje: “Dema ku me deşt bi nûjenkirinê kir, Şêx Nûrî serok bûye li ber vê yekê ku şiyana belavkirina wan helbestan hebû, bi vê wateyê ku her çi dixwest, belav dikir”; Lê mamošta Goran bo belavkirina helbestên xwe wiha nebû. Şêx Nûrî Salih çendîn şiyana û pisporiyên wî hebûn. Wî bilî helbestvanî, karê rojnamevanî, rexneyên wêjeyî, sirûdên zarokan, çîrok û ... hwd dikir ku heta astekê bo her yek ji wan deştpekeke nû tê hesêb.

Di deştpeka şoreşa “Şêx Mehmûd” de û di dema deştilatdariya wî de, Şêx Nûrî Salih heta dema koça dawiyê wekî helbestvan,

rewşenbîrekî şareza ê serdem li derdora “Şêx Mehmûd” û piştevanê wî bû û ti carî bawerî bi Birîtaniyan nekir. Bi awayekî ku Şêx Nûrî Salih bi sedema hişyarî û jêhatîbûna xwe û gotarên wî yên siyasî li ser rewşa Kurdî di wan serdeman de, bibû bi berpirsê rojnameya “Bangî Kurdistan” û herwisa li rojnameya “Jiyan” de wekî bersivderê rojnameyên Erebbî di wê serdemê de wekî “Necme û ... hwd bûn ku di gelemper de, hizra siyasiya Şêx Nûrî Salih dide xuya.

Şêx Nûrî Salih xwestiye ku binyata gotareke siyasî ya modern danê û çendîn bûyerên siyasî şirove kirine û pêşbîniya hindêk tiştan kiriye, wekî mînak pîrsa Lozan û pîrsgirêka Mûsil û ... hwd. Şêx Nûrî Salih hewla çêkirina projeya bi netewîkirinê li ser kaxezê bi wateya li ser rojnameyan daye û piştî xwestiye wan projeyan bo bazneyeke mezintir kûrtir bike û hizra û nasnameya Kurdî bi cîhanê bide nasandin û di civaka Kurdî de êdî wekî bi tenê diyalog nebe, belkî mezintir û berfirehtir be. Şêx Nûrî Salih wekî helbestvanekî modern, gelek girîngî bi şewaz û wateya helbestan daye û herwisa yekem helbestvanê Kurdî e ku rexneya wêjeyî bo nav wejeya Kurdî anîye. Piştî di çend gotaran di bin navê şewaz û kesayeti, bi rohnî bas ji hez û şewaza wejeyî dike. Herwisa dikarin bibêjin ku ew yekem helbestvan e ku li ser teorî û hizra wejeyî gotar nivîsandine. Eva vê yekê dide xuya ku Şêx Nûrî Salih şarezayî li ser wejeyên gelên din jî hebûye. Zimanê helbestvaniya Şêx Nûrî Salih: Bê guman cudatiya di navbera zimanê helbestan û zimanê asayî bi sedema peyv, zarave û deştewajeyan nîne, belkî vedigere ser şewaza bikaranîn û rêkxistina peyv li rîsteyê. Ziman şewazeke girîng a nîşandana hunerê ye; ew giringiya jî ji taybetmendiyên ziman ve tîne, wekî vê yekê ku ziman

kereştayeke bîngêhîn an ku deqan pêk tîne, di vê demê de ku ziman dikeve nav pîşeya deqê, ew yasa diguhere û dibê bi zimanekî din. Di vê derheqê de Prof. “Izzeddîn Mîstefa Resûl” gotiye ku “Ziman bi diyardeya yekem a hemû berhemeke hunerî tê danîn” û herwisa hizra wî ev e ku “Ziman kilîda zêrîn a vekirina tev deriyana e”.

Helbestvanên Kurdî di helbestên xwe ên Kurdî de bi giştî ji zimanekî tevlihev ji peyv û zaraveyên biyanî mifah vergirtine û bi rêya wî zimanî ve berhemên xwe afirandine.

Şêx Nûrî Salih wekî tev helbestvanan di cîhanê de girîngî bi zimanê helbestî daye û hewl daye bi rêya ciwankariyê re afirankariyan bike û zimanê helbestiya Kurdî ji zimanekî tevlihev ve ber bi zimanekî bi tevahî Kurdî ve bibe ku qonaxên zimanê helbestiya wî helbestvanî ji 3 qonaxan pêk hatiye:

1-Qonaxa bizarkirin li zimanê helbestvanên kilasîk ên Kurdî

2-Qonaxa karlêkeriya wêjeya Tirkî

3-Qonaxa mifahvergirtin ji zimanê zelal ê Kurdî

Di qonaxa yekê de Şêx Nûrî Salih bîzarê zimanê helbestvanên kilasîk kiriye an ku deştpeka cîhana helbestên wî ji wan cure helbestan pêk hatiye û ew jî asayî ye û piraniya helbestvanan hewlê didin ku li pey helbestvanên berî xwe pêngavan hilgirin û afirankariyan bikin û piştî şewaza xwe bigirine ber xwe. Wekî mînak helbestên “Esker Şêx Nûrî” ku bi rohnî li jêr karlêkeriya wê gonaxê de ye û dibêje:

Sef sef ke dên û tê eperin
çuşt û ba wiqar

Mazî le sîdqî ewe, ebînim
eke fîrar

Sobhêkî pak û bê xeş, ebînim
wekû Behar

Moşteqbelêkî bê leke, pir
keyf û neş`edar

Di wir de tejî peyv û zarawayên biyanî ne ku ji aliyê helbestvan ve hatine bikaranîn ku zimanekî tevlihev ji peyvên Kurdî û peyvên biyanî ye û helbestvanên kilasîk bi wî zimanî helbestên xwe raçandine.

“Şêx Nûrî Salih” di qonaxa duyê de li jêr karlêkeriya wêjeya Tirkî de deşt bi nûkirina helbestan kiriye û ew jî bi wê sedemê ye ku bi başî zimanê Tirkî zaniye û mifah jê vergirtiye.

Di qonaxa sêyem de, Şêx Nûrî Salih hewlê dide ku bi tevahî peyvên zelal ên Kurdî di helbestên xwe de mifahê jê verbigre û peyvên asayî ên li ser zimanê xelkê û wêjeya netewa Kurdî û folklorê bi awayekî serkevtî bi afirankariyan û ciwanî û xemilandina wan peyvên helbestên xwe raçîne ku bi wê sedemê “Refîq Hilmî”, Şêx Nûrî Salih wekî rêberê şoreşa helbestên Kurdî li devera Silêmaniyê û avakerê dîbîstana nû ya Kurdî bi nav dike. Di helbesta pepûle de bi rohnî tê dîtin ku Şêx Nûrî Salih bi zimanê asayî yê xelkê, zimanekî wêjeyî yê folklorîk, Kurdiya zelal, nivîsandiye:

Xozge emzanî to bo?

Wa xot kirdûwe rence ro?

Pepûle balî helwerîw

Be tîşkî gir darizîw

Baldarî ciwan û rengîn

Êsk sûk û bal nexşîn

Renge hin rexne li zimanê

helbestên wî bîne girtin li ber vê yekê ku wî nekarîbû berî belavkirina wan pêdeçênê li ser wan helbestan bike.

Çavkanî:
Diwana Şêx Nûrî Şêx Salih
Beha îstatîkekanî Şêir
Bîrî neteweyî lay Şêx Nûrî
Şêx Salih

Zimanê medyaya koloniyalîzê li derheq wate û destewajeyên taybet bi Kurdistanê



N: Mardîn Rehîmnîjad

W: Bêhzad Simko

Çêkirina çemk û destewaje û guherîna wata di edebiyata medyayî de û propagandeya koloniyalîzma Îran bo guherîna nasnameya Kurd û Kurdistanê, şerekî berdewam û bêrawestan a medyayên Fars e. Çêkirina wan destewajeyan projeyek koloniyalîstî ye bo tevlihevkirina navend û derdorên wê û herwisa rêxweşkirin bo projeya asîmîlasyon û vergirtina ax, çand, kultûr û kelepûra Kurdistanê ji Kurd û tapokîrîna wan wekî milkê netewa xwedî desthilat û herwisa tejkîrîna hizira Kurd ji wan destewajeyan, garantiya desthilat Fars e.

Her wekî “Jacques Lacan” gotiye: “Em di hêla bêjeyan de tevlihev dibin”. Faşîzma Fars piştî avakirina Dewlet-Netewya sexte ya Îranê, di siyaseta ragihandinên xwe de hewl daye ku hizir û bîra Kurd bi hin “çemk”an ku berhema gotara serdest in, teji bike û ew wate û destewaje ku di navbera me û wan de hêlên cudatîyê ne, kêmrang bikin û bi awayekî wan biguherînin ku rêgirî ji çêkirina dîskors û wateya Kurdî bike.

Yek ji wan mijarên ku bi rohnî di nav ragihandinên Îranê de tene dîtin, hevahengiya tevav ji bikaranîna “çemk” û destewajeyên pêwendîdar bi Kurd û Kurdistanê ye. Ragihandinên Îranî yên Fars ziman çî yên desthilatdar û çî yên opozîsiyona rejîmê, li asta netewa Kurd de her yek edebiyatê bi kar tînin û bi xweşt û daxwazeke koloniyalîstî dixwazin nasnameya Kurdistanîya Kurd reş bikin.



Wekî mînak, ew destewajeyên jêrîn tev berhemên gotara desthilatdar in ku li tevahiya ragihandinên Farsan de di yek raştayê de tene bikaranîn: “Kurdê Îranê, “menatîqên Kurdnişîn”, Kurdên resen, Kurdên sînorîşîn, “Kordha” (bi cihê Kurd), zaraveya Kurdî, zimanên Kurdî, “merzdarên xeyûr” an hevwaterkirina navê Kurd digel “Qetlên Namûsî” û kolber ûhwd”.

Bi çî armançekê ew destewajane tene bikaranîn? Bo mînak destewajeya “Menatîqên Kurdnişîn” liberçav bigirin; Eger li bajarê Lendenê bi wan deverên ku Ereba tê de dijîn, ji wan re bibêjin deverên Erebnîşîn ên Lendenê an deverên Tirknişîn ên Almaniyayê, ew destewajeye ti pirsgrêkek nîne, çimkî tevahiya wan kesan koçber in û di welatê duyem de li yek an çend deverên diyarîkirî de akincî ne; Lê ger bibêje deverên Îngilîzînişînên Lendenê, ew şandina nasnameya xwedîbûna nîştîmanî ji Îngilîzê ye û wan bi koçber û mêvan di welatên wan de dizanin.

Mediyayên Fars ziman jî her wê çemk û destewajeyê bi zanebûn û bi pîlan bikar tînin, bo vê ku Kurd ku xwediyê axa Kurdistanê ne û nasnameya wan bi şerek nerim yê medyayî reş bikin û ev yeka bi awayê kirêtî rojane tê berdewamkirin. Ew destewajane, Kurd li ser axa xwe dike mêvan, koçber û netewa sexteya Îranî an ku Fars dike xwediyê Kurdistanê.

Aliyê din yê bikaranîna peyva “Menatîqê Kurdnişîn” ev e ku Kurd bawerî bi wî welatê sexte bike û ji seha netewiya Kurd bo seha sexteya netewiya Îranê biguhere.

Destewajeyeke dinê ku bi piranî û bi zanebûn ji aliyê ragihandinên Farsan ve tê bikaranîn, hevwaterkirina Kurd digel qetlên namûsî ye. Di halekê de ku pêka amaran, Rojhilatê Kurdistanê di hember navçeyên dinê de kêmtirîn rêjeya kuştina jinan heye û zêdetirîn rêjeya kuştina jinan li Tehran, Kerec û Îsfahanê de ye. Ragihandinên Fars qetla namûsî di Kurdistanê de dikin bi diyardeyeke etnîkî ya taybet bi Kurdan û ev yeka tenê bo şikandin û reşkirina Kurd û bêzarkirin û şermezarkirina Kurd ji Kurdbûnê ye.

Destewajeyek din ku ragihandinên Koloniyalîzmê hewla cihgîrkirina wê didin, peyva “Merzdarên Xeyûr” e. Ev destewajeya çedîn pîlan li pişt hene. Yekem, sînor curek seha perawêzkevtin û bêdesthilatîyê li cem Kurd diafirîne û ev yeka Kurd di kuncê de bi bê desthilat dide xuya. Duyem, Kurd dike bi parêzerê sînorê welatekê ku xwediyê wê neteweyek xwedî desthilat û xwediyê şariştaniyet e û Kurd rola berevaniyê pê hatiye spartin. Sêyem, ew sînorane bo netewa Kurd sînorên destçêkirî ne û wan sînorane qebûl nake, di dewreyek zemanî de û di proseyeke dinê de ku ew sînorane bi berdewamî kuştina Kurdan li pey hebûye û sînor û mirin tevlihev bûne; Kurd baweriyê bi wan sînoran nake heta ku bibe bi parêzerê wan sînoran an bi gotina wan bibe bi “merzdarê xeyûr”.

Bi sedan wate û destewajeyên wiha hene, ku tenê hewce ye vê yekê bibêjin ku ti wate û destewajeyek di ragihandinên Koloniyalîstî de bi bê pîlan nîne û bê pîlan nayê bikaranîn û divê netewa Kurd bi hûr ve agehdarê wan mijarane be.

Nerîna Lîderan



“El Kazimî”:

“Mûşekên “xiyanet”ê min dilsar nakin û çî bandorekê li ser karûbarê hêzên ewlehî bo parastina ewlehiya xelkê û parastina mafê wan dananê”.




“Muqteda Sedir”:

“Ew kiryar asayîş û aramiya welat dike armanc û mebesta wan ev e ku Îraq bikeve rewşeke aloz da ku hêzên derveyê dewlet wê kontrol bikin û Îraqê bixin rewşeke tevlihev, tundûtîjî û terorê de”.



“Umît Dede”:

“Serdozgerê Komarî di doznameya girtina HDPê de, 451 endamên HDPê herî zêde bi hewl û xebatên wan yên aşîxwaz, di Proseyê Çareseriyê Pirsê Kurd de tawanbar dike. Darizandina hewlên HDPê yên di Proseyê Çareseriyê de him dijî yaseya 6551emîn ya navxweyî ye, him jî li dijî hiqûqa navdewletî ye”.



“Elîrîza Kazimî”:

“Di îsal de 970 hezar dersxwanan li Kurdistanê û Îranê dev ji xwendinê berdane”.

Îran îdiayê dike ku ew bombeyê naxwazin!



N: Eskender Ceiferî

Di rojên derbasbûyî de rejîma Îranê careke din îdia kir ku ew bombeyê naxwazin û wê piştî 3 heftiyên din, careke din danûstandinên “Etomî” dest pê bikin.

Di dema desthilatdariya Hesên Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 1399an a Rojî, Mihemdcewad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkevîna “Etomî” ji aliyê wan ve na-keve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Berîtaniya, Feranse û Almaniyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Piştî “Donald Trump” Serkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dewsa xwe da “Joe Biden” û dihat pêşbînîkirin ku dewleta “Biden” vegere ser gotûbêjan ji bo rêkevîna etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz hertim dibêjin rêkevîna dixwazin, lê Spaha Pasdaran dibêje nabe rêkevîna bê kirin.

Di rastî de armanca rejîma Tehranê berhemana bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyandina Uranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzikî berhemana bombeyê dibin.

Niha dewleta “Biden” jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemana bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerîna e û dibêje nabe Îran bibe xwediyê bombeyê.

Komara Îslamî jî bersiva ber-



pirsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: “Wê cihan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke”. Piştî ku “Donald Trump” peymanî Etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, “Rex Tillerson” Wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkevîna Etomî ya bi Îranê re were guherandin û ji nû ve were nivîsandin, lê ji bo razîkirina Îranê ew li benda piştgiriya hevalbendên xwe yên Ewropî ne. “Tillerson” got jî, ku xelên rêkevîna tîra xwe tund nînin û rê li ber bernameya Etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi “Cevad Zerîf” hevtayê xwe yê Îranî û wezîrê derve yên welatên ku peyman wajo kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê “Sergey Lavrov” Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li “New Yorka” Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevkerîna ya “Donald Trump” Serkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya Etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Feransa, Berîtaniya û Almaniya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nêzikî berhemana bombeyê ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegehrînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran rêkevîna naxwaze.

“DYA” bi raportên çalakiyên Etomî yên Îranê re bi baldarî reftarê dike û gotara Wezîrê Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyanan bersiv nade ku çima Amerîka di wajokirina raportan de dudil

e û sedem çî ne, lê bi gotara “Hesên Rûhanî” zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkevîna dîkin. Rêkevîna Etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên Ewropî hatibû wajokirin û li gor wê, Îranê hin çalakiyên Etomî kêmkirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê jî destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkevîna naxwazin. Beriya niha jî berpirsên saziya “Nehêlana Çekên Etomî” ragihandibûn, her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriyê, lê çavên Ewropîyan li Amerîkayê ne. Her biriyarekê ku “Washington” distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtaniya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên Etomî yên Îranê demûdest wajo bike, lê “Trump” li pey planeke din digere.

Ji bilî berpirsên bilind ên Îsraîlê, fermendarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkevîna bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagîr bike.

Almaniya, Berîtaniya û Feransê ku roleke mezin di rêkevîna de hene, dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Uranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zêdetir ji berê bo ser cihanê bibe gef. Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Uranyomê ne ji bo karûbarên pîzîşkiyê û enerjîyê ye, lê belê li tevahiya cihanê, ev asta Uranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemana bombeyê tene bikaranîn.

Li bendê ye 3 heftiyên din armanca rejîma Tehranê ji bo meyandina Uranyomê eşkere bibe.

Doza Kurdî di navbera otonomiya Rûsan û şaredariya rêjîmê de



N: Ebdûlazîz Qasim

Serokê berê yê Pakîstanê “Mihemed Ziya El-Heq” dibêje ku: “Yê serederiya bi Washington re bike wekî destê xwe bavêje komirê, ku tiştek ji bilî tenî û rûreşî nagihêjê”.

Roj bi roj bêhtir eşkere dibe ku pîrsa vekîşîna hêzên Amerîka ji Rojavayê Kurdîstanê pîrsek cidî ye, ku Amerîka dê hêzên xwe yên leşkerî nêzîk yan dereng ji navçeyên Kurdî yên li Rojhilatê Feratê vekîşîne, herwisa ku pîrsa diyaloga Kurdî-Kurdî bi carekî hatiye paşguhxiştin û ti garantiyek ji bo destpêkirina wê nîne.

Dibe ku çend serbazgehên Amerîkî li devera Dêrazorê û li ser sînorê Îraq-Sûriya bimînin, bi taybetî serbazgeha “Tenef” ji bo kontrolkirina derwazên sînorî ji çalakiyên milîsên Şî'e yên Îran û Îraq û Hizbullah, dibe ku demê vekîşîna hêzên Amerîka ji Rojavayê Kurdîstanê hatibe destnîşankirin, wisa xuya dibe ku dê di demek nêzîk de be, tevî ku Amerîka xwe berî dagîrkirina “Girêspî û Serêkani”yê di 20 Cotmeha 2019'an ji bo rojek weha xwe amade kiriye.

Wekî dizanin ku Amerîka hêzên xwe carek din piştî dagîrkirina “Serêkaniyê-Girêspî”, di bin givaş û fişarên navdewletî de û bi taybetî di bin fişara Feransayê de vegeand, lewra dihat pêşbînîkirin ku rolek Feransa li navçeyên Kurdî piştê vekîşandina hêzên Amerîka ji Sûriyê hebe.

Hemû hewldan û gefên Tirkiyê yên li vê dawiyê dihatin bi armanca herî sereke ku hêzên Fransayê nabin alternatîv li

şûna hêzên Amerîkayê li Sûriyê, herwisa ji bo Kurd nabin xwedan statuyek piştî vekîşîna hêzên Amerîka, û mixabin aliyên Kurdî nebûn harîkar ji bo serxiştina hewldanên Fransayê, ku diyaloga Kurdî-Kurdî bixwe projeyek Feransî bû bi armanca yekxiştina hêzên HSD û Pêşmerge Rôj ji bo parastina maf û hebûna gelê Kurd.

Dîsa xuya dibe ku Tirkiyê, di hevdîtina “Biden û Erdogan” di çarçoveya lûtkeya Romayê “G20”ê de, hin destkevtên din bi dest xistin, nemaze rawestandina alîkariyên Amerîkayê yên leşkerî ji bo hêzên HSD.

Îro, li Moskowê çend hevdîtin li gel aliyên Kurdî tene lidarxiştin ji bo tevlikirina Kurdan di nav hikûmeta Sûriyê de û vegeandina navçeyên Kurdî li jêr kontrola rejîmê, tevî ku heta niha Amerîka razî nebûye li ser vegera hêzên rejîmê li navçeyê, ji ber tîrsa derbasbûna milîsên Îranê û Hizbullah û dixwaze ku navçe bikeve di bin kontrola hêzên Rûsî de, û bi dîtina ku di navbera Îsraîl, Rûsiya û Amerîka de, rêkevînek li ser rewşa ewlehî û leşkerî ya Sûriyê heye, bi taybetî piştî hevdîtina Serokwezîrê Îsraîlê “Naftali Bennett” û Serokê Rûsyayê “Vladîmîr Pûtîn” di 22ê Cotmehê de li bajarê Soçî yê Rûsyayê, tevî ku li meha September/ Îlona borî, Wezîrê Derve yê Rûsyayê “Sergey Lavrov”, di kongireyeke rojnamevanî de ligel Wezîrê Derve yê Îsraîlî, “Yair Lapid”, tekez kiribû ku Rûsiya bikaranîna xaka Sûriyê li dijî Îsraîl û dewletên din red dike, û gotibû: “Em li dijî vê yekê ne ku Sûriya bibe qada şer li dijî welatên din”.

Bi vî awayî îro, ku bêhtir zelal dibe ku doseya Sûriyê bi carekî ketiye di destê Rûsyayê de, wekî hemû dizanin ku Rûsiya dixwaze tevaya Sûriyê careke din bikeve di bin kontrola rêjîmê de, û hevdîtina wê digel aliyên Kurdî û hin aliyên Sûrî yên din dikeve di heman çarçoveyê de, tevî ku heta niha Rûsiya ji bo mafê gelê Kurd tiştek pêkêş nekiriye, lê wekî propaganda ku di hemû hevdîtinên wê dawiyê li Amerîka û Rûsiya, bi awayekî balkêş mafên Kurd û Kiriştîyan û Elewîyan yek ji rojeva wan hevdîtinan e, lê heta niha ji aliyê rejîmê ji bo çareserkirina pîrsa Kurdî ji bilî hin mafên şaredarî tiştek din nehatine qebûlkin.

Helwesta Rûsiya heta niha zelal nîne, ku bitenê dixwaze rejîmê vegere bi hemû saziyên xwe li navçeyên Kurdî bi rêya lihevhatin û diyalogê, ji bo vê yekê daxwaza pêkanîna şandeke Kurdî hevbeş kiriye û çendîn car ji aliyê rayedarên Rûsan behsa renge otonomiyek ji Kurdan hatiye kirin û di reşnivîsa destûra Sûrî de ya ji aliyê Rûsiya ve hatiye nivîsandin, tê de behsa otonomiyê ji bo Kurdan hatiye.

Otonîmiya Rûsan ew jî zelal nîne, û wekî xuya ye ku ew jî rengê ji rengên vajîkirina pîrsa netewî ya Kurdî ye, ku îro di nav civaka Kurdî de tîrsek mezin heye li ser valakirina pîrsa Kurdî ji naveroka wê ya netewî, nemaze ku li pêş Kurdan çî derfetên zêde nînin, tevî ku îro bi awayekî xuya her wekî di edebiyatên partiyên Kurdî jî de, kêmbahsa pîrsa Kurdî wekî pîrseke netewî dibe, ku wisa tê xuyakirin ku destberdarî ji federasyonê jî hatiye kirin, tevî ku tiştek netewî di edebiyatên hin partîyan de nîne.




Welatiyekî Kurd bi sedema teqîna mînê birîndar bû

Roja Çarşemî 12`ê Xezelwerê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Hêmin Îbrahîmî”, xelkê gundê “Şelmaş” ê ser bi bajarê Serdeştê, di encama teqîna mînê de bi awayeke dijwar birîndar bû.

Ew welatiye di dema çêrandina ajelan de li nêzî gundê “Doletû” yê ser bi bajarê Serdeştê, raştî wê bûyerê hatiye.

Pêka gotina çavkanioyeke agehdar, “Hêmin Îbrahîmî” bi sedema kûrahiya birînin wî bo çareserîya pizîşkî, bo nexweşxaneyek li bajarê Urmiyê hatiye veguhestin.

Di wê derheqê de, roja Pêncşemî 6`ê Xezelwerê,



welatiyekî Kurd ê bi navê “Zaniyar”, li encama teqîna mînê, li binkeyekî betalkirî ya leşkerî li gundê “Zelê” yê ser bi bajarê Serdeştê, birîndar bû.

Welatiyekî Kurd bi sedema teqeya hêzên leşkerî yê rejîmê hate birîndarkirin

Roja Înê 7`ê Xezelwerê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Azad” xelkê gundê “Doletû” yê girêdayê bajarê Serdeştê bi sedema teqeya hêzên leşkerî hate birîndarkirin.

Ew welatiye li dema çêrandina pezan li nêzîkê yek ji binkeyên ser sînor ên bajarê Serdeştê raştî teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî hat û pêyê wî hate birîndarkirin.

Ew welatiye bo tedawiya pizîşkî bo navendên dermanî hatiye veguhestin.

Her di wê derheqê de, roja Pêncşemî 6`ê Xezelwerê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Zaniyar”, ji encama teqîna mînê ve li binkeyekî betalkirî yê gundê “Zelê” yê ser bi bajarê Serdeştê, birîndar bû.



Li bajarê Kirmaşanê jinek ji aliyê hevjinê xwe ve hate kuştin

Îro Duşemî 10`ê Xezelwerê, bi sedema pirsgerêkên malbatî, jinek ji aliyê hevjinê xwe ve li bajarê “Sunqur û Kulyayî” yê girêdayê bajarê Kirmaşanê hate kuştin.

Lêpîrsê taybet ê “qetl” li bajarê “Sunqur û Kulyayî”, “Benî Amêriyan” tevî piştraştîkirina wê nûçeyê, ragihand: “Demjimêr 5`ê sibêdeha îro Duşemî, ew bûyerê qewimiye û ew jina ciwan xelka yek ji gundên bajarê “Sunqur û Kulyayî” yê ye.

Herwisa Benî Amêrî gotiye: “Di encama lêkolînan de derkevtiye ku ew jina bi lêdana tiştên giran ji aliyê hevjinê xwe ve, hatiye kuştin û di wê derheqê de, piştî demjimêrekê bikujê wê hate binçavkirin.

Tevî ku heta niha nasnameya wê jinê nehatiye eşkerekinê, lê ew berpîrsê qezayî, dayez zanîn ku sedema kuştina wê jina ciwan pirsgerêkên malbatî bûne.

Her dê wê derheqê de, roja



Înê 23`ê Rezbera sala 1400`an, jineke Kurd a bi navê “Leyla Şekîba”, temen 39 salî, keça “Fetullah” û xelkê bajarê Sineyê, bi destê hevjinê xwe yê bi navê “Behram Bextiyarî”, li yek ji malên şeqama “Rokna” ya bajarê Hemedanê, bi derba çeqûyan û bi awayekî dirandane kuştîye.

Konserta li Kela Hewlêrê rastî eleqeyeke mezin hat

Kela Hewlêrê roja Înê Rêkevtê 5`ê Çirriya Paşîn a 2021`an mazûvaniya hunermendên ji her çar perçeyên Kurdistanê kir û awaz û muzîka Kurdî ya ji her aliyên Kurdistanê bi şewazên cuda hat pêşkêşkirin û bû sedema kelecaneke mezin û rastî eleqeyeke mezin hat.

Rêkevtê 5`ê Çirriya Paşîn a 2021`an bi sponsoriya Rûdawê, beşdariya hunermendên ji her çar perçên Kurdistanê û serpereştiya Hejar Zehawî, li Kela Hewlêrê konsertek hat sazîkirin û 2 demjimêran berdewam kir û rastî eleqeyeke zêde hat.

Hejar Zehawî di destpêka konsertê de axaftinek pêşkêş kir û spasiya Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî kir ku ev heyama du salan e piştgiriya wan dike.

Herwiha Hejar Zehawî spasiyên xwe yê taybet pêşkêşî Rêveberê Giştî yê Tora Medyayî ya Rûdawê Ako Mihemed kirin ku di heyama 9 salên derbasbûyî de piştewaniya wan kiriye û wek ku ew dibêje, “(Ako Mihemed) piştewanekî mezin ê huner û muzîkê bûye, ne tenê bo wî, ji bo hemû hunermendên din.”

Hejar Zehawî di wê axaftina xwe de tekez kir ku bêtî piştgiriya Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Rêveberê Giştî yê Tora Medyayî ya Rûdawê Ako Mihemed, ev projeya wî bi sernediket.

Zehawî behsa kesek sêyem jî kir û got, “Hinek heştên min ên taybet heen, dayika min li vir e îşev, hebûnawê bo min heştê ecêb e.”

Piştî axaftina Hejar Zehawî, grûpên muzîkê yê ji her çar perçeyên Kurdistanê, huner û stranên xwe pêşkêş kirin.

Ev konsert bangeşe û destpêkek bû bo vekirina Mala Muzîkê ya Zehawî (Zahawy Music House) ku biryar e sala 2022an bê vekirin û bi gotina Zehawî dê li Hewlêrê



her meh konsertekê saz bikin.

Mala Muzîkê ya Zehawî li gel sazîkirina konsertan, dê workshop û masterclass`an ji bo ciwanên Hewlêrê û hogirên muzîkê pêk bîne û bi hunera beşên din ên Kurdistan û cîhanê aşîna bike. Konsertê bi du stranên grûpa ji Rojavayê Kurdistanê destpê kir û Nesrîn Dawûd û Sefqan Orkêş bi hev re stran pêşkêşî beşdaran kirin.

Sefqan Orkêş jî axaftineke kurt kir û jibîlî derbirîna xweşhaliya xwe li ser vê proje û konsertê û got, “Gelek kêfxweş im ku li Hewlêrê dengê muzîkê bilind dibe. Li Kurdistanê berê dengê şer û gulleyan dihat û niha dengê muzîkê bilind dibe.”

Piştî grûpa ji Rojava, dor hat grûpa Rojhilatê Kurdistanê û hunermend Ferdî Îlhamî got ku tembûr, amûreke Kakeyî û Yarsanî ye û diyar kir, heta 50 sal berî niha jî tembûr tenê li cexxane û malan bû, heta wê dema ku mezînekî Yarsanî yê bi navê Emrullah Şehab Rehîm, tembûr ji cexxaneyan derxişt derve.

Ferîd Îlhamî got jî, ew awaza ku di konsertê de pêşkêş dîkin, muzîka meqamê Yarsaniyên Sehene yê Kirmaşan e.

Grûpa Bakurê Kurdistanê jî du stran amade kiribûn û Enwer Aydın li ser wan stranên got, ew herdu stranên bi navên `Çoxo` û `Çelê Berçelan` stranên folklorîk yê herêma Cîlemêrgê ne.

Grûpa Başûrê Kurdistanê ya bi serpereştiya Goran Kamîl, du stranên folklorîk pêşkêşî amadebûyên konsertê kirin. Ç: RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Welatiyekî Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Sêşemî 11`ê Xezelwerê, welatiyekî kurd ê bi navê “Enwer Şêxe”, temen 45 salî, kurê Ebdulla û xelkê gundê “Peswê” yê ser bi bajarê Pîranşarê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo ciheke nexuya hate veguhaştin.

Ew welatiye bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin.

Heya niha lêpeyketina malbata “Enwer Şêxe”, bo agehdarbûn ji qedera navbirî bi encam mane.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatiyê Kurd hatiye sepandinê, ti zanyariyek li ber deşt nîne.

Heyama mirexesiya Selah Şerîfzade hate demdirêjkirin

Heyama mirexesiya girtiyê siyasî yê Kurd “Selah Şerîfzade”, xelkê bajarê Bokanê, bo 4 rojên din hate demdirêjkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew girtiyê siyasî li roja Dûşemî 3`ê Xezelwerê, bi danîna barimteya 2 mîlyard Tumenî ji girtîgeha Xelxalê, bo heyama 7 rojan hatibû mirexesiyê.

Ew girtiyê siyasî yê Kurd li meha Gelawêja îsal, li girtîgeha Xelxalê tûşî vîrûsa Koronayê bibû.

Ew welatiye li roja Şemî 4`ê Reşemeya sala 1397an, ji girtîgeha navendiya bajarê Urmîyê, bo girtîgeha Xelxal a ser bi Parêzgeha Erdebêlê hatibû veguhaştin.

“Selah Şerîfzade” li 14`ê Pûşpera sala 1397an, bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên dijberî hikûmeta Îranê” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî binçavkirinê bo girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Urmîyê veguhaştibûn.

Navbirî li 14`ê Befranbara sala 1397an, piştî bidawîhatina heyama lêpîrsînê ji girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Urmîyê, bo girtîgeha navendiya wî bajarî hatibû veguhaştin.

“Selah Şerîfzade”, ji aliyê taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê Mihabadê, bi tohmata “Endambûn li yek ji Partiyên Kurd yê dijberî hikûmeta Îranê”, cezaya 2 sal û 6 meh girtîgeha teizîrî li ser sepandibûn û ew cezaya li roja 6`ê Cozerdana îsal, hatiye piştraşt kirin.

Herwisa ew welatiye, li 4`ê Pûşpera sala 1374an, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û ji aliyê dadseraya giştî û şoreşa Xelxalê, bi tohmata “mihariye û mîfsid fi El-erz”ê, 16 sal girtîgeha teizîrî li ser sepandin û ew cezaye li dadgeha pêdaçûyîna de hate piştraşt kirin.

“Selah Şerîfzade”, piştî wê yekê ku li aliyê dadseraya giştî û şoreşa Xelxal, cezaya 16 sal girtîgeha teizîrî bi ser de sepandibûn ji Îranê derkevtibû.

Ew welatiye piştî binçavkirinê li Pûşpera sala 1397an, dawîhatina qonaxên lêpîrsînê li girtîgeha bajarê Urmîyê, bo girtîgeha Xelxalê hatibû veguhaştin.

Heyama binçavkirina “Soida Xedîrzade” hate demdirêjkirin

Roja Sêşemî 11`ê Xezelwerê, heyama binçavkirina demkî ya welatiyeka Kurd a bi navê “Soida Xedîrzade” keça “Rehîm” û xelkê bajarê Pîranşehrê bo heyama 20 rojan hate demdirêjkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew welatiya ducan e û di heyama binçavkirina xwe de ji tedawiya pizîşkî hatiye bê par kirin û hewcehî bi çavedêriya pizîşkî heye û herwisa ji hevdîtin digel malbata xwe û hebûna parêzer hatiye bêparkirin.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: “Heyama binçavkirina wê welatiya Kurd bo heyama 20 rojan hatibû demdirêjkirin û ew duhemîn car e ku heyama binçavkirina wê tê demdirêjkirin.

“Soida Xedîrzade” di girtîgeha Îtla`ata Spahê li bajarê Urmîyê de lêpîrsîn ji wê tê kirin.

Roja Pêncşemî 22`ê Rezberê, hêzên ewlehiyên hikûmetê ew welatiya Kurd bi bê nîşandana hukmê dadweriyê ew binçav kiribûn. “Soida Xedîrzade” xîzandar û xwediyê du zarokan e.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wê welatiyê hatiye sepandin ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Mala “Mîstefa El-Kazimî” bo bi armanca balafirên bombrêjkirî

Sibêdeha Yekşemî mala Serokwezîrê Îraqê “Mîstefa El-Kazimî” bo bi armanca balafirên bombrêjkirî û çend kes ji parêzvanên wî birîndar bûn.


Sibêdeha roja Yekşemî 7`ê Çirriya Paşîn 2021`an, mala Serokwezîrê Îraqê “Mîstefa El-Kazimî” li devera “Kesik” a ser bi bajarê “Bexda”yê bû bi armanca balafirên bombrêjkirî. Tê zanîn ku çend xulek berî wê êrîşê, Mîstefa El-kazimî hatibû aghdarkirin ku biryar e mala wî rastî êrîşan bê û wir bi cih bêhle, lewma ti ziraz-rek canî bi Mîstefa El-kazimî nekevtiye, lê çend kes ji parêzvanên wî birîndar bûne û bo yek ji nexwşxaneyan hatine veguhaştin, piştî wê êrîşê li bajarê “Bexda”yê rewşa awarte hatiye ragihandin.

Piştî “Mîstefa El-kazimî” bi belavkirina girte vîdiyoyekê li ser rûpela xwe ya “Twitt”ê, bas ji başbûna rewşa tendirûştîya xwe kiriye û daxwaz ji xelkê Îraqê kiriye ku bi aramî û diyalogê rewşê aram bikin.

Di vê derheqê de Fermandehiya Opozîsyonên Hevbeş ya Îraqê ragihandiye: “Em mijûlê peydakirina bikerên wê kiryara terorîstî ne û herwisa mijûlê peydakirina wan kesan in ku dixwazin ewlehiya Îraqê aloz bikin”.

Wezareta Derve ya Amerîkayê êrîşa ser mala Serokwezîrê Îraqê Mîstefa El-kazimî şermezar dike û wek kiryareke terorîstî bo ser dilê dewleta Îraqê binav dike.

Di daxuyaniya Berdevkê Wezareta Derve ya Îraqê “Ned Price” de hatiye: “Em çavdêriya nûçeya êrîşa balafirên bêbalafirvan a ser mala Serokwezîr Kazimî dikin û dema me dît zerar negihiştîye wî me heşt bi aramiyê kir.” “Mesûd Barzanî” Serokê Berê yê Herêma Kurdistanê jî di daxuyaniyekê de êrîşa li ser mala Mîstefa Kazimî bi tundî şermezar kir û hêviya başbûnê ji bo birîndarên wê êrîşa terorîstî xwast.



“Mesûd Barzanî” di peyama xwe de daye zanîn: “Divê rêz li serwerî û armîya Îraqê bê girtin û bi hewla hemû aliyan rê li ber dûbarebûna kiryarên terorîstî yê bi vî rengî bêne girtin.”

Piştî hewla kuştina Serokwezîrê Îraqê Mîstefa Kazimî, fermandarê hêzên ewlekariyê rewşa awarte li Bexdayê ragihand.

Femandariya Hêzên Ewlekariyê di daxuyaniyekê de diyar kiriye ku rewşa awarte li Bexda hate ragihandin û bo her eger û bûyereke nexwastî di amadebasiyê de ne.

Rewşa bajarê Bexdayê di roja Înê 14ê Xezelwera 1400`an a Rojî de aloz bû, û di devera kesik a bajarê “Bexdayê” de terorîstên ser bi rejîma Îranê bi sedema şikestxwarina girûpên “Şîe” di hîlbijartinên Îraqê de, tundûtîjî û alozî afirandin.

Çend roj berî niha jî, Serokê Grûpa Esaîbî Ehlî Heq “Qeys Xezelî” beriya êrîşa li ser mala Serokwezîrê Îraqê Mîstefa Kazimî bi gotina wî gefa “xwîna şehîdan” li Kazimî xwaribû.

Hêj nediyar e ku ew kiryara terorîstî ji aliyê çi girûp an jî bi piştevaniya çi welatek cîran hatiye kirin. Lê ji par ve heta niha girûpên terorîst ên ser bi rejîma Îranê êrîşên bi vî awayî li ser Îraq û Herêma Kurdistanê kişandine stuyê xwe. Ew balafirên bimbrêjkirî jî, ji aliyê rejîma Îranê ve bi wan girûpan